

Ji bo agahiyên zêdetir yê di derbarê karê SSPF de bi kordînorê SSPF re têkilî deyne:

Anna Lindestig  
[anna.lindestig@ostersund.se](mailto:anna.lindestig@ostersund.se)

072-502 29 58



**Hevkariya di navbera  
Dibistan, Karûbarê Civakî,  
Polîs û Dema Vala de.  
Piştgiyeyek ji bo malbatê  
xwedî xortên di navbera  
12-16 salî de.**



## **SSPF**

SSPF ji bo hevkarîya di navbera Dibistan, Karûbarên Civakî, Polîs, Dema Vala û ciwanên di navbera 12-16 salî de.

### ***Nihênîgirtin/Bidizîgirtin***

SSPF li ser bingeha ku Serperîştê zarokan bi nivîskî qebûl bikê ku Karmendên Dibistanê, Karûbarên Civakî, Polîs û yê Dema vala dikarin li ser ciwanan dema pêdivî hebê ji bo hevkarîyê agahîyan bidin hevdû.

### ***Armanc***

Pêwîste ku ciwan xwediyê dibistanek aktîf bin û jiyaneke bê dermanê narkotîkî û sûcan bijîn

### ***Mebest***

SSPF forûmeke ji bo danûstendina agahdariya bi mebesta xwe gihandina zarok û ciwanên di rewşa birisk/bixeter ya sûc de ye. Karmendên ji Dibistan, Karûbarên Civakî, Polîs û Dema Vala hevkarîyê bi Serperîştê/Weliyê zarokan re dikin ku pêşveçûnek erênî ji bo ciwanan pêş bixin.

### ***Kengî SSPF dikarê aktuel bibê?***

Gava ku di derheqên jêrîn de fikar hebin:

- Gumanên kirinên sûc (şêlandina biçek, tundî, dizîn, hwd.)
- Bikaranîna/firodana alkohol û/anjî narkotîkê
- Di hawîrdorên neminasib/derdorên nebawer de xwe livandin
- Tasawasa di derheqê têkiliyên di hevaltî yê de
- Bêdewamî

## ***Çawa?***

Nûnerê ji van çar pargîdaniyan/fealiyetan agahiyê li ser SSPF`ê didê Serperîştê/Weliyê zarokan ji bo ku razîbûna hevkarîyê bistîne. Divê razîbûna ku kordînator dîv re karibê formeke nixandina xeterê/rîskê ji Dibistanê, Karûbarên Civakî, Polîs û Dema Vala bixwaze hebê. Piştî nixandinek giştî, di koma xebatê de biryarek tê girtin ka SSPF aktuele û/anjî hewcedariya piştewaniyek din heye.

Gava ku kesek anjî bûyereke pêwîstiya wan ji bo hevkarîyê SSPF hebê, Şaredariya Östersund wiha dikarê alîkariyê bidê:

- Kordînator bi Serperîştê/Weliyê zarokê û ciwan re hevdîtinê çêdikê da ku rewşa heyî di ber çav re derbas bikin - hêz /pêdivî, netverka/tora tîkiliyê, pêşnumandina armancê formule kirin.
- Kordînator banga civîneke netverkîyê li gel Ciwanan, Dêûbav herwiha kesên li derdora ciwanan dike, wek mîne kesek ji Dibistanê, yek ji Dema Vala, yek ji Karûbarên Civakî û herwiha bi sîd wergirtina ji endamên din yên malbatê re.
- Di civîna netverkê de planaziyek hevbeş û hevpar ji bo ciwanan hatiye çêkirin ku hedefên zelal û bi pîvan hatine destnîşan kirin. Di planê de bê çî, kengî û ji hela kê ve wê werê kirin diyare, herwiha tarîxa şopandina planê.
- Kordînator berpirsiyarê ku her kesê karibê plana biryarnamêyê bi dest bixê û herwiha ji bo hewceyîya danûstandinê jî wê amade bê.

Dema wazîfa SSPF ya koma xebatê nemênê, bi dawî dibê anjî malbat bîryara didê ku edî pêwîstî bi xebata SSPF nîne.